Ji bo biyaniyan planê kursa perwerdeya swêdî a nuh (sfi)

Armanca perwerdeyê

Bi riya zimên ji bo mirov pencereyek din a cîhanê vedibe. Ziman wekhevî û cihêbûna navbera tiştên mirovan ên kesayetî, bingehî û meraqa wan derdixîne meydanê. Sfi keysê dide wan xwendevanan ku derveyî swêdî bi zimanekî din dipeyivin da ku ew karibin zimanekî nuh fêr bibin û xwe bi pêş bixin. Li wir bilêvkirineke xweşik jî fêr dibin, ji ber ku keysa danûsitendineke xweş jî çêdibe. Peyivîn jî li gora rîtîm û melodiya zimen pêk tê. Jêhatîbûna fêrbûn û bi pêşxistina zimanekî nuh, bi xwe re rehetî û bawerîya bi xwe jî xurt dike. Bingehê kesayetî û serpêhatiyên kulturî di peyva mirov de xuya dibe.Girîng e ku mirov zanibe hevgirtin û têgihiştina zimanekî çawa ye ku ew ziman di girêdanên zimên de bête bikaranîn. Perwerde dê keysê bide ku xwendevanek ewçend serdestiya zimên bike ku karibe dersên xwe çêbike û beşdarî civatê û jıyana xebatê bibe. Perwerde dê keysê bide ku mirov çawa karibe ziman fêr bibe.

Sfi beriya hertiştî, kurseke bi kalîte a ziman e. Li vir têkiliya bi hev re merkezî ye.Xwendin divê xîtabî bal û întresên cuda cuda ên xwendevanan bike. Daxwaz, pêwîstî û giringiya zimên ji bo herkesî cuda ye û ev divê xîtabî herkesî a cuda bike. Nirxandina pêwîstiya xwendevan bi xwndevanên din re çêdike wek dokument têt girtin. Hilçinandina nivîsaran, axaftin û munaqeşeyan li gora musteweya xwendevanan û polê wan têt hilçinandin.Têgihişina hereketa civakî jî pê re têt dayîn.Ev divê bikaribe dengekî di nav perwerdekirina ziman, zanist û civakê de pêk bîne.

Ev pir girîng e ku ji bo xwendevanan mecala pêkanîna axaftina ziman di jiyana kar û xebatê de û çalakiyên din de were dayîn.Wek hilbijartina jiyana xebata karkirinê, mecala qulubandina xwendina xwe, praktik û wekî din mecala xwendinê were dayîn. Sfi dikare bi karkirina bi heq ve were meşandin û zemîna xwendin û karkirinê were amadekirin. Ev li gor rewşa merivan a pêştir tê nêrîn û li gora kesayetiya mirovan û erbabiya wan a kevin li gor vê xwendinê li hev tê ragirtin.

Bingehê perwerdeyê

Xwendina perwedeya zimên bi sê riyan çêdibe, Sfi 1, Sfi 2, Sfi 3 a ku li gor zanîn û bingehên xwendvanan ên berê, li gor pêwîstî û armanca wan hatiye amadekirin. Sfi 1 du kursên sfi A û B dinimîne. Sfi 2 du kursên sfi ne ku B û C ne. Sfi 3 jî du kursên sfi ne ku ew jî C û D ne. Her merhaleya kursê ji du kursên cihê ên ku li gor fêrkirinê di nav dibistanê de reng digire û têt amadekirin, pêktêt. Xwendevan dikare di dema perwerdeyê de mecala plançêkirina xwendina xwe bi riya alîkariya armanca xwe û xalên ku dixwaze bigihê di nav demeke têrker de çêbike.

Di nav kursan de riya xwendinê ji yekê pirtir e. Ji wan kursan her yek du kurs in. Kursa B û C dikare hem bibe kursa destpêkê a bingehîn hem jî kursa piştî a bingehîn. Tevî ku kursek kare hem a bingehîn be hem jî a berdewama kursa bingehîn be.Wexta meriv nav ji bo qeydê dinivîsîne, li aynî cihê mirov nav dinivîsîne. Lê belê wexta kurs destpêdike kare ew kurs rengekî cuda bide.Ev cudakirina xwendevanan li gora zanîna wan a swêdî û li gora armanca wan têt guhertin. Ji bo li ser wê/wî kesî/kesê nêrînek were dayîn divê di destpêkê de mustewa wan bête zanîn û li gora mustewa wan ji wan re kursek bête dayîn.Tevî ku xelaskirina xwendevanan a xwendina sfi piştî hin kursen destpêkê û têrkirî kare were qebûlkirin, lê belê ji bo hemû xwendevanan heya bi kursa D mafê domkirinê heye û divê were dayîn.

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê tê maneya ku xwendevan bêyî xwendina xwe a berê kare ji nuh ve fêrî xwendin û nivîsandinê bibe. Fêrkirina xwendin û nivîsandinê ji kesên ku berê kêm xwendibin û di zimanzanînê de pir jêhatî nebin re ye. Fêrbûna ziman bi qasî rewşa vêtiniya bingehî wext dixwaze. Herwuha

ji kesên ku berê ne bi tîpên latînî fêrbûbin hîn jî zahmettir e. Ji bo wan pêşî divê karê fêrkirina herfên latînî dest pê bike. Piştre divê xwendin û nivîsandin dest pê bike.Ji bo kesên wuha prosesa xwendinê kare cuda be. Fêrbûna xwendin û nivîsandinê hew bi kursên A û D nayê girêdan. Dikare ji bo wan hinek mecalên din were dayîn, yan bi erbabiya wan a kesayetî, yan jî bi kursên cuda tên xurtkirin û hev temam dikin.Ev proses jî ew ê di dema xwendina sfi de were kirin ku wexta kutayiya dibistanê sfi de kosp dernekeve. Perwerdekirina ziman kare bi zimanên xwendevanan ê zikmakî yan jî bi zimanekî din were meşandin. Ev jî dê bi paralelî zimanê swêdî ve bibe.

Armanc

Armanca sfi ew e ku xwendevan bi pêş keve

– Erbabiya xwendin û nivîsandina swêdî bi pêş bixe.
– Erbabiya axaftinê, axaftina bi hev re, xwendin û guhdarîkirin û di hemû rewşan de tegihiştina xwe pêş bixe.
– Bilêvkirineke baş û rast.
– Karina xwe a bikaranîna pergalên vêtiniyê xurt bike.
– Kapasîta zimanê xwe ji bo herkesî û li gora her mercan bikaribe bi kar bîne.
– Têgihiştina ku mirov çawa karibe fêrbûna ziman û
– Pêşxistina zanîna zimanê xwe, stratejîyên danûstandinê û hînbûnê pêk bîne.

Nirxandin û dayîna qarneyê

Bingehê nirxandinê

Di beşê xwendin û nivîsandina ziman de qarne nayê dayîn. Qarneya ku ji bo kursên A-D derbas dibe, di dema xelaskirina kursê de tê dayin.

Nirxandin li ser zanîna xwendevanan a ku bi armanca wan ve digunce, tê dayîn. Nirxandin li gor pîvana qarneyan divê bi musteweya kursê jî li hev bike.

Di sfi de dayîna qarneyê tê manaya ku:

– Xwendevan bi çi awayî dikare daxwaza xwe bi nivîskî û axaftinî bîne zimên û têbigihêje.
– Xwendevan çawa dikare li gora kesên cuda ziman bi kar bîne û li gora her rewşê biguherîne û biguncîne.
– Erbabiya têgihiştina bûyeran bi tevayî yan ji niqteyên wan ên detayên biçûk. Ango nuansên ziman ên kûr û dûr têbigihêje.
– Xwendevan çiqes dikare rêzên bingehîn ê zimên takîp bike, çiqasî kare beşdarî hevpeyvîn û muneqeşeyan bibe. Ji bo tegihiştinê zorê bide xwe. Her xwendevan ji bo zimên fêr bibe çawa kare li ber xwe bide ku ziman fêr bike. Tahlîla fêrbûna usluba xwe a fêrbûna zimên çawa dike da ku bikaribe erbabiya zimanê xwe bi rewşeke fonksîyonel bi pêş bixe û bide nîşandan.

Bingeha rêza zimên

Sfi ji hin beşan pêk tê; beşê serbest, beşê fêrbûna xwendin û nivîsandinê ku ew jî çar beş e.

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê:

Kursa A
Kursa B
Kursa C
Kursa D

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê

Berê vê beşa fêrkirinê, li biyaniyên ciwan û navsere ye ku, di bingeha xwe de fêrî xwendin û nivîsandinê nebûne. Yan jî fêr bûnê lê bi tipên ne latinî fêr bûne û pêwistiya wan bi fêrbûna xwendin û nivîsandina swêdî heye. Fêrkirina xwendin û nivîsandinê dikare bi swêdi be û dikare bi zimanê wan ê zikmakî be yan jî bi zimanekî dîtir be.

Armanca fêrkirina xwendin û nivîsandinê

Divê xwendevan;

– Têbigihê ku bi xwendinê çawa dikare xwe ifade bike û ziman çawa saz bûye.
– Karibe ziman di gelek rewşên cihê de bi kar bîne.
– Karibe rêzmana nivîsandinê a normal bi kar bîne.
– Karibe xwendin û nivîsandinê ji bo fêrbûnê, tegihiştinê û xwe ifadekirinê bi kar bîne.
– Zanibe ku mirov çawa kare ziman hîn bibe.
– Karibe riyek hêsan a pêşxistina fêrbûna xwedin û nivîsandina zimên ji bo armancên cihê peyda bike.

Kursa A

Divê kurs erbabiya xwendevanan a têkiliya ziman bi axaftinê pêk bîne. Herwuha divê xwendevan di hemû rewşan de karibe ziman bi kar bîne. Nivîsan û peyv divê ji tiştên ku bala xwendevan dikşînin, bi pirsgirêkên zimên û axaftinê, meraq û intereseya xwendevanan vêtinî û kiryarên rojane ve girêdayî bêtin hilçinandin. Kurs ji xwendevanan re nêrîna riya fêrbûna ziman bide û fêrbike ku kîjan stratejîyên cuda kare ji bo ziman were bikaranîn. Herwuha wek tiştên ji bo fêrbûnê alîkarî dikin û têkiliyên bi hev re.

Armanca ku piştî kutayiya kursê divê xwendevan bigihê

Divê xwendevan;

– Karibin cawaziya zimanê xwendin û axaftinê ji nav hev derxin.
– Di rewşên hêsan de karibin bi devkî têkiliyan deynin.
– Karibin zimanê axaftinê, zimanê hêsan têbigihên.
– Bi hêsanî karibe zanin û erbabiya xwe bi devki bîne ser zimên.
– Karibe hinek materyalên nivîskî vergerine û:
– Divê têbigihê ku meriv çawa zimanekî fêr dibe û ji bo vî tiştî bikaribe materyalên alîkar bi kar bîne.

Pîvanên qarneya kursa A
Ji bo qarneya pîvana Baş (G)

– Bi aîkariya vî tiştî xwendevan xwe mecbûrî beşdariyê dibîne û ji bo zanîna devkî a hêsan dibe destek.
– Xwendevan beşdarî axaftina rojane a hêsan dibe û xwe mecbûrî têgihiştina axaftina rojane ya aşîna dibîne.
– Xwendevan di derheqê tîştekî aşîna de dikare bi devkî û bi têgihiştin û bi ahengekî bîne ser zimên û biaxife.
– Bi alîkariya tiştên ku nivîskî fêrbûye xwendevan dikare ji bin bûyerên rojana rabe.
– Xwendevan dibe nimûneyek ku vê fêrkirinê çiqas li ser wî tesîr kiriye.
– Bi alîkariya materyalên alîkar xwendevan dikare fêrî têkilî danînê bibe

Ji bo qarneya pîvana Pir baş (VG)

– Xwendevan bi awayekî bi xwe bawer bi hêsanî ji bin axaftinan dikare rabe.
– Xwendevan kare beşdarî tiştên rojane ên hêsan bibe û têgihiştina xwe nîşan bide.
– Xwendevan li ser tişteki aşîna kare bi devkî û têgihiştî bi ahengiya rewşê bipeyive.

Kursa B

Kurs dê keysê bide ku xwendevan karibe bi axaftin û nivîskî têkiliya xwe bi pêş bixe. Tekst û axaftin ji bo pêwîstî û lazimiyên xwendevanan in. Xala bingehîn jiyana kar û civata Swêdê ye ji bo xwendevan were hilbijartin. Erbabiya fêrbûnê ew e ku xwendevan bikaribe tarîfkirin û pêşkirina xwe bi pêş bixe. Herwaha bikaribe tiştên alikar bi dest bixe û jê îsifade bike.

Armanca ku piştî kutayiya kursê divê xwendevan bigihê

Divê Xwendevan:

– Karibe bi nivîskî têkiliyên rojane ên derûdor bimeşîne.
– Karibe tiştên hêsan ên nivîskî û devkî têbigihê.
– Karibe erbabiya zanîna xwe bînê holê û di jiyana Swêdê de deyne ber hev û li hev biguncîne.
– Karibe prova çêbike, li ser tiştan şîroveyan bike û fêrî zimanê swêdî bibe.
– Karibe materyalên alîkariyê bikar bîne û têkiliyan bi derûroda xwe re deyne.

Pîvanên qarneya kursa B

Ji bo qarneya pîvana Baş (G)

– Xwendevan kare li ser tiştеki aşîna bi rêkûpêk û xweş biaxive.
– Xwendevan kare bi zimanekî xweş li ser bûyerekê agahdariyan bide.
– Xwendevan kare li ser nivîsên rojane haydariyan bide û bide fahmkirin.
– Xwendevan beşdarî her babet axaftinên rojane bibe ku li hawirdor çêdibin.
– Xwendevan kare bi nivîskî derdên xwe bi kûrtayi bide zanîn
– Xwendevan li ser vê fêrkirinê kare nêrîna xwe bibêje.

Ji bo qarneya pîvana Baş (VG)

– Xwendevan li ser tiştekî ku ew dizane, kare bi devkî dîtinên xwe bibêje.
– Xwendevan di derheqê tiştekî aşîna de li ser detayên biçûk kare bi rêkûpêk biaxive.
– Xwendevan kare bi aktîfî beşdarî axaftinên cûrbecûr bibe.
– Xwendevan kare têkiliya xwe bi nivîskî bîne zimên û tiştekî bi nivîskî şîrove bike.

Kursa C

Kurs divê bibe hoya pêşxistina zimanê xwendevanan bi devkî û bi nivîski. Tekst û axaftinên ku tên hilçinandin divê ji meraqa xwendevanan û pêwîstî û daxwaza wan were hilbijartin. Herwaha erbabiya ku tiştan bide ber hev jî dikeve nava wê. Civata Swêdê a rojane û civata Swêdê a kar bi civatên din ve muqayesekirin xala bingehîn e. Refleksên wan û plankirinên wan bi xwe jî ciyekî girîng digirin.

Armanca ku piştî kutayiya kursê divê xwendevan bigihê

Divê xwendevan;

– Karibe di gelek rewşan de girêdana têkiliyê bi devkî û bi nivîskî bi awayekî jêhati pêk bîne..
– Karibe nivîsarên cihê û peyvên ku di rewşên cihê de têne gotin fêm bike..
– Karibe zanîn û erbabiya xwe a li ser zimên, jiyana kar û kulturê bide ber a din a li Swêdê.
– Karibe stratejîyên cihê deyne ber xwe ku planê fêrbûna xwe çêke, tiştên alikariyê ji nav hev derxe û swêdî fêr bibe.

Pîvanên qarneya kursa C

Ji bo qarneya pîvana Baş (G)

– Xwendevan kare tiştên ku ew nas dike têbigihê û mirov têbigihîne.
– Xwendevan bi devkî û nivîskî xwe bi rewşekî vekîri û diyar tîne zimên ji bo bikaribe erbabiya xwe diyar bike, nêrîna xwe di derheqa tiştên rojane û civata kar de şîrove bike.
– Xwendevan dikare bixwîne û wergerîne malumatên ku tên dayîn; naveroka xebitandina tiştan bi nivîskî dikarin herwuha wêneyên grafîkan, diagram û tabelayan dikarin bi nivîskî tebigihên.
– Xwendevan kare tekstên ku li ser jiyana rojana hatine nivîsandin bixwîne û şîrove bike, herwaha nivîsên weke çîrok û şiroveyî têbigihê û nivîsên edebî kare bixwîne û şîrove bike.
– Xwendevan di fêrbûna swêdî de bi usluba xwe a kesane nêzîkî fêrbûnê bibe. Bi usluba xwe a kesane rê û rêzana fêrbûna swêdi peyde bike û vê fêrbûnê hêsan bike.
– Xwendevan kare tiştên alîkar û giranbuha ji bo fêrbûnê bi kar bîne .

Ji bo qarneya pîvana Pirbaş (VG)

– Xwendevan kare li ser tiştekî aşîna pir bi rêkûpêk û bi nuansên biçûk, li ser naveroka wê pirsgirêkê biaxife.
– Xwendevan kare bi aheng, bi devki û nivîskî meramê xwe bîne ziman. Daxwaza xwe bi tegihiştinî û bi hawayên cîhê cîhê bîne zimên, xwendevan kare ji bo erbabiyên xwe û nêrînên xwe di derheqe jiyana rojane xwendin û rewşa karkirîne bêne zimên.
– Xwendevan kare nivîsanên rojane bixwîne, bi wan binivîsîne û bi devkî şîrove bike.
– Xwendevan kare stratejîyên cîhê û tiştên alîkar bi kar bîne û zehmetiya problema zimên çareser bike.

Kursa D

Ev kurs, keysê dide ku zanîna xwendevanan a li ser swêdî bi pêş keve û kûr bibe. Nivîs û axaftinên ku tên hilçinandin, ji bo xwendevanan balkêş in û ji wan re pêwîst û girîng in. Jiyana kar û civata li Swêdê a rojane tê axaftin û muqayeseya wan bi rewşa welatên din re tê kirin û dibe xala bingehîn. Kurs ji bo xwendevanan îmkana zanîna zimên dide a ku xwendevan karibe zimanê xwe li gor kes û mercên cûda bi awayekî bi xwe bawer bi kar bîne. Xwendevan bi zanayî kare stratejîyên cîhê ji bo domandina fêrbûnê bi kar bînin.

Armanca ku piştî kutayiya kursê divê xwendevan bigihê

Divê xwendevan:

– Karibe xwe bi awakî bi xwe bawer bîne zimên.
– Karibe bi nivîskî û devkî di gelek rewşên cûda de, di derbarê civata kar û rojane de bi rêkûpêkî biaxife.
– Karibe rewşa xwe û erbabiya xwe a zimên bi a kesên din re bide ber hev, herwaha rewşa kultur û civata Swêdê bi a welatên din re bide ber hev..
– Karibe bixwîne, têkiliyan deyne û li ser nivîsarên cîhê cîhê karibe biaxife.
– Karibe ji bo fêrbûna Swêdî stratejîyên cîhê bikarbîne, karibe pîlanê domandina xwendina xwe çêbike û tiştên alîkarên bêhempa bikarbîne.

Pîvanên qarneya kursa D

Ji bo qarneya pîvana Baş (G)

– Di derheqê nivîsên cîhê de xwendevan têdigihê û kare naveroka nivîsanê axaftinê bibêje.
– Xwendevan beşdari axaftina li ser jiyana rojane, jiyana karkirinê û a civakî dibin û axaftî beşdari munaqaşayan dibin.
– Xwendevan kare bi fesihî û têgihandî û bi detayên biçûk bi devkî û nivîskî xwe bîne zimên, herwuha nêrîna xwe a şexsî li ser xalên ku dixwaze bêje xûya bike.
– Xwendevan kare nivîsên guhertî bixwînin û naveroka wan têbigihê.
– Xwendevan kare tecrubeya xwe a di warê ziman, kultur, civat û jiyana xebatê de bide ber a kesên din.
– Xwendevan li ser stratejîyên fêrkirinê karin munaqaşe bikin û li ser hilçinandina materyalên alîkar nêrîna xwe bibêjin.

Ji bo qarneya pîvana Pirbaş (VG)

– Xwendevan têdigihê û kare di derheqa nivîsên aşina û neaşina de têbigihên û naveroka wan bidin têgihandin.
– Xwendevan kare bi devkî beşdari axaftin û munaqeşeyên li ser rewşa jiyana rojane a kar û jiyana civakî bibe û li ser wan tiştan bi argument nêrîna xwe bêje.
– Xwendevan karin pir baş tekstên cîhê cîhê bixwînin. Di derheqê naveroka armanca wan de nêrînên xwe bibêjin û nêrînên xwe çerçewe bikin

Şiroveyên

Li ser planê kursa swêdî û fêrkirina zimên ji bo kesên biyanî (sfi)

Di sala 2002/2003 an de dokumenta meşandina kursên swêdî û fêrkirinê ji bo biyanîyan hate guharandin. Ji bo alîkariya mamosteyan bike, Dezgeha dibistanên gişti materyalên alîkariyê danî pêş: *Sfi, Program û planên fêrkirinê* herweha *Materyalên nirxandinê. Swêdî ji bo kesên biyanî. Kurs A-D. (Sfi. Kartläggning och studieplanering* samt *Bedömningsmaterial – Svenska för Invandrare Kurs A–D.)* Ev herdu materyal jî di malpera Dezgeha dibistanên gişti de hene û meriv dikare ji wê werbigire. Malper: www.skolverket. Ev di bin navê Xwendina kesên mezin de heye / Sfi (Vuxenutbildning/Sfi).

Ev planê kursê ê ku ji 1ê çileya paşî a sala 2007 an de dest pê kiriye, bi pêşniyara guherandinên xwendina swêdî ve tête nîşandan. Bi navê *Hinek pirsên li ser xwendina kesên mezin* di pêşniyara destûrê de bi cîh bûye (2005/2006: 148). *(Vissa frågor om Vuxnas Lärande* (prop. 2005/2006: 148)[1]:

”Dewlet; ji demeke dûr û dirêj ve xebatekê dimeşîne ku bikaribe biyanîyan li civata Swêdê biguncîne. Ji bo kesê ku tê Swêdê bikaribe bi lez bikeve nav civatê û kar bike, zanîna zimanê Swêdî bingeh e.”

Ev guhertin di maddeya 13an, a di destûra dibistanan (1985:1100) de hatiye çêkirin û di wê maddeyê de tête dîtin. Û herweha li nîzama perwerdekirina zimanê swêdîya ji bo biyanîyan (1994:895) jî meriv dikare vê beşê di malpera Dezgeha dibistanên gişti de, bi navê destûr û nizaman bibîne.

Armanca van guhertinên ha ji bo ”pêşxistina kalîte, başkirina netîcê û bilindkirina navpêlên ku li sfi dixwaze” Ev jî tê wê maneyê ku:
– Biyanîyên mezin ên nexwenda, bi xwendina sfi keysa xwendina destpêkê bi dest dixin.
– Fêrkirina xwendin û nivîsandinê dikare bi zimanê wan yê zikmakî were dayîn yan jî bi zimanekî din.
– Di van kursan de xala bingehîn fêrkirina zimanê swêdî ye, herweha fêrkirina jiyana civakî jî tê de ye. Karê wê ê pêşî fêrkirina zimaneki bi kalîte ye.
– Ji bo qerneyê puanên ku tên dayîn dê werin guharandin; baş (G) û pirbaş (VG) û.
– Dezgeha dibistanên gişti lê digere ku puanên qarneyan bilintir bike û bike pirbaş (VG) jî.

Xwendina alfabeyê (a ku bingeha xwendin û nivîsandinê ye) divê li sfi jî were fêrkirin. Ji bo xwendina kesên mezin wek zemîna bingehîn were danîn. Li wir di nav çarçoveyekê de swêdî wek zimanê duwemîn were dayîn. Bingeha xwendin û nivîsandinê dikare bi zimanê xwendevanan ên zikmakî jî were dayîn yan jî bi zimanekî din dikare were fêrkirin.

Bi fermî ev xwendin 525 seat in û di heftekê de bi kêmanî divê 15 seat ders bête dayîn. Heger xwendevan bixwaze û belediye jî, ji bo bingeha xwendinê gihaştibe armanca xwe, ev wexta xwendinê dikare were kêmkirin. Ew dema ku bi alfabeyê derbas dibe ji derveyî van 525 seatan e. Belediye bi dezgahên bajêr ên bi vî karî re alaqedar in, hevkariyê dike ji bo ku xwendevanekî di sfi de dixwïne îmkanan pêk bîne da ku zimanê swêdî bi kar bîne û bixe jîyana xebatê û sfi bi aktîvîteyên din ve were temam kirin. Wek bi riya karkirinê yan jî bi riya guherandina karê xwe ên berê yan jî bi praktîkan û bi xwendinên din dikare bibe. Herweha belediye divê lê bigere ku xwendevan mafê nexweşiya xwe, li gora rêzana (1962: 381), sîgortaya tevayî bi dest bixe, da

[1] *www.regeringen.se*

ku sfi bikaribe di warê tendurustî û nexweşiyan de çalakiyên xwe bidomine. Divê bi riya kar û meşqûliyetên bi heq û pere, sfi were temamkirin.

Destûra dibistanan di meha temûza sala 2006 an de ji bingeh ve hate guhertin. Di bin birê 13 beşê § 1 de hate çêkirin. Guherînên ku di rêzana dibistanan de li ser alfabeyê û li ser perwerdeyê hatine kirin, dê di 1ê çileya paşî a sala2007 an de bikevin jiyana perwerdê.
Li ser nirxandinê jî, Dezgeha dibistanên giştî berê tenê wek pîvan puana baş (G) digirtin. Rewşa qernedayînê hate guhertin: bi baş (G) û pirbaş (VG) ve bi riya Dezgeha dibistanên giştî puandayîn hate guhertin û ji bo herdu krîteran guhartin hatin çêkirin. Di derheqa vê guhertinê de biryarên ku hatine girtin di 15 û 16 §§ de bi navê kursên swêdî ji bo perwerdeya biyanîyan guhertin hate çêkirin û ji roja 1ê çileya pêşî 2006an derbas dibe.

Palpiştiya ji bo bingehê xebata planê kursê

Ji kar û barên Dezgeha dibistanên giştî, karê herî pêşîn ew e ku sfi bibe dibistaneke bingehîn û bi kalîte ji bo fêrbûna zimanê swêdî. ”Ev kursa planên nuh li sfi, bi perwerdeya kalîteyeke baş dê pêşxistina fêrbûna zimanê swêdî bilindtir bike.” (Ji wezîfeyên Dezgeha dibistanên giştî a welêt yek jî ew e ku ji bo kursên perwerdekirina biyanîyan planekî nuh çêkin, ji bo (sfi) û ji bo ên din.) (Uppdrag till Statens skolverk att utarbeta en ny kursplan för svenskundervisning för invandrare (sfi)). Perwerdehî divê nêrînekê ji bo û li ser têgihiştina civata swêdî jî bide. Di teksta daçekên pêşniyarên hukmatê de nivîsandiye ku:

”Ziman û tore pir nêzi hev in. Di hemû perwerdeyên zimên de ew tekstên ku tên xwendin, li ser rewşa civatê, li ser zimanî rojane û rewşa kulturî herweha li ser zanistiya ziman, civak û welêt e jî.”

Herweha di vê nivîsê de jî tê gotin ku ev alikî pir baş e ji bo perwerdekirina kesan, serwextî zimanê civaka rojane bibe û bi civaka kar ve jî were girêdan. Bo wê girêdana kursên fêrkirinê bi bêjeyên kar û meslekî alikî baş e. Piraniya xwendevanan bingeheke kar û xebatê ji welatê ku jê tên bi xwe re tînin. Ji bo zanîna û erbabiya xwe a berê bi civata swêdî ve biguncînin û zanîna xwe nêzîkî a swêdî bikin û zûka bikaribin bikevin nav civaka swêdî a karkirinê, perwerdekirina ziman a şexsi divêt.

Mamoste ji bo hilçinandina metodan azad in. Bi vi awayî dikarin balansa musteweyên newekhev bibînin. Herweha sfi dê bibe baştirîn merkeza fêrkirina zimên. Ji alîkî din ve jî dibe hoya ku agahdariya civatê belav bibe ew agahdariyên ku divê zûka werin belav kirin û ên ku werin dayîn bi zimanên zikmakî: Agahdariya civakî jî karekî belediyan e ku divê belediye ji kesên nûhatî re yeko yeko di derheqê mafên wan de, wan haydar bike.

Bi hevkariya planê kursan, Dezgeha dibistanên giştî bûye xwedîyê agahdariyên berfireh û pêwîst e. Herweha erka karekî dewletê jî bi cîh hanî. Dezgeha dibistanên giştî di sala 2003 de rewşa planê kursa swêdîya ji bo biyanîyan[2] têde nirxandibû û îstatîstîk çêkiribû[3]. Vi tiştî Dezgeha dibistanên giştî ev tişta bi riya hemû sfi yên belediyeyên cuda cuda çêkirin: Anketa xwe bi riya programa webbê pêk anî û ji rektorên dibistanên sfi ên hemû belediyeyên welêt çêkirin. Ji alîkî de jî bi çar belediyeyan re hevpeyvîn pêk anî.

Bi hevkariya Dezgeha karûbarên (AMS) Daîreya biyanî û penaberan, Dezgeha pêşxistina karûbarê dibistanan, Belediyeyên Swêdê û bajaran bi hev re ji bo karekî hevbeş li hev kirin û pêk ve ji bo kesên biyanî û penaberên nûhatî zemîna karkirinê pêk bînin *(Överenskommelse om utveckling av introduktionen för flyktingar och andra invandrare)*. Ji bo vî karî Dezgeha dibistanên giştî û (AMS) bi hev re axafîne ku pêwîstiya perwerdekirina zimanê swêdî ku bazara kar divêt, bi çi hawayî pêk were û meriv çawa bi hev re xebatê bike ku van pirsgirêkan çareser bike.

---

[2] *Effektstudie – sfi-kursplaner. Dnr* 75-2006:835

[3] *Utbildningsresultat* 2006 – *Riksnivå. Rapport nr* 274

Kî dikare di Sfi de bixwîne?

Sînorê ji bo xwendina sfi 16 ye. Di vê navberê de belediye dikare destûrê bide wan kesên ku tevî ku mafê wan ê xwendina sfi heye, bihêle herin dibistanên normal ên gymnasiet, heger ew keç yan kûr bi xwe jî daxwaz bikin û şertê çûyîna lîseyê jî hebe, wê gavê mafê wan e ku herin dibistanên lîseyên normal. Ji bo hinek kesan çûyîna lîsêyê tiştekî normal e, lê ji bo hinekan jî ne normal e û dixwazin di çerçeweya sfi de xwendina xwe bidomînin. Kîjan ji wan museait be ew rewş ji bo herkesî bi awakî cuda têt çareserkirin.

Berpirsiyariya belediyeyan ew e, her kesê ku mafê wan ê xwendina sfi heye ji bo wan vî mafî pêşkêş bike û ji bo her kesê ku mafê xwendina swêdî heye teşwîkî vê xwendinê bike da ku ew jî beşdarî vê perwerdekirinê bibin. Kesê ku dixwaze beşdarî xwendina sfi bibe heger karker be, wê gavê belediye bi xwediyê cîhê karê wî kesî re û organa karkeran re dikeve pêwendiyê da ku bikaribin perwerdekirina ziman bê pere çareser bibe. Lê belê perekî kêm ji xwendevanan tê girtin. Perwerdekirin di nav sê mehan de divê were destpêkirin heger kesekî/kesekê dest bi kursa sfi kiribe mafê wê/wî ê berdewamê heye. Xwendevan divê dewam bike, lê belê carna tiştên ji rêzê der dikare hebin, yan mercên xwendevan ê dewamkirinê nebe.

Xwendina di sfi de

Xwendina sfi ji bo kesên ciwan û navsere ên biyanî ku di zimanê swêdî de zanîna bingehîn dê bigirin û ji bo pêwîstî û armanca wan a şexsî bi riya pêşxistina erbabiya zimanê nivîskî û devkî pêk were û di karê rojane û karê jiyana xebatê de bikarbîne xebata li ser alfabeyê him ji bo kesên kêmxwenda û bêsewad, hem ji bo wan kesên ku bikaribin bi xwendin û nivisandinë jî derbas dibe.

Xwendina zimên divê hêja û bi mane be û ji armancekê re bibe bingeh. Herweha xwendina din a ku ya şexsan bixwe a şexsi be meriv dikare bi vê xwendinê ve jî paralel bimeşîne, a praktîk, nexweşî û kar jî pê re dikare were meşandin: Di rewşên wuha de divê ji bo fêrbûnê programek were çêkirin. Ew kes bê serêş dikarin bi çalakiyên waha xwendina xwe bimeşînin.Alfabe bi dersên sfi têt meşandin û heya bi dawîyê dom dike, ji ber ku fêrkirina zimên prosesek e ku zanîn li wir dikeve nav meji û refleksê wan têde bi cîh dibe.

Fêrkirina zimanê swêdî berë xwe dide kesên ku xwedî armancên cuda cuda ne, bi xwendinên wan ên berê bi jiyanê wan û tecrubeyên karê wan û bi temenê wan heryek çawaniyeke cuda didin. Di wan gurupan de heryek li gor sewiyeya xwe û li gor kapasîteya xwe bi kursan ve têt girêdan. Ev têt wê manayê ku xwendevan dikarin bigihên armancên xwe bi riya kursên sfi ên cûr be cûr.

Xebata hevbeş di navbera dezgahên fêrkirinê û dezgahên din wek dezgahê kardîtinê (AF) girîng e. Ji kesên xwendevan re ev tişt pëwîst e da ku bi vî awayî bikaribin herdu dezgah bi hev re planekî rast ji kesên xwendevan re peyda bikin. Ji ber wê jî hemû bi hev re û bi xwendevan re jî plan têt kirin û ji bo xwendina wan îspat bibe dokumentek hazir dibe. Ji bo wê jî pergalekî alîkarî wek, xwendina wan kesan ên şexsî jî dikare were nîşandan. Heger ew bixwazin pirtir agahdarîyê werbigirin, dikarin li malpera Dezgeha dibistanên gîştî binêrin û li ser vê yekê zêdetir bixwînin ku têde bi navê *planên xwendina şexsî, kursên şexsî, kaxizên qarneyên şexsî, dibistanên kesên mezin ên belediyeyî, (Individuell studieplan, individuell kurs och intyg i kommunal vuxenutbildning)* meriv dikarin malumatan jê bigirin. Di derheqa xwendina cawazî û şexsî de ji malpera wan a www.skolverket.se di bin navnîşana xwendina kesên gihaştî were girtin. *(Vuxenutbildning)*.

Sfi karaktera pêşxistina fêrbûna zimanê dide xwendevan ku ew ziman di wî welatî de têt axaftin. Mexseda fêrkirinê ew e ku xwendevan daxwaza fêrbûnê hîs bike û bikaribe di pir rewşên cuda de ziman bi kar bîne û jê re bikaranîna ziman xweş were. Bi riya pêşketina ziman a tevayî, rewşa têkiliya bi hev re jî pir û xurt dibe. Rewş ew e ku têgihiştina tevayi di alîyê zimên de pêk were û di navbera herkesî de tevî heyîna rewşên cuda û mustewayên cuda de bikaribin guncîna zimên pêk bînin. Dema ku rewşa zimên a heyî têrî têgihiştina xwendevanan neke wê gavê divë stratejiyên din werin bikaranîn. Wek formulên têgihandinên din, bi bêjeyên manayên cuda, bi pirs û bi hereketên dest û lingan divê were pejirandin. Zanîna zimên bi telafuzê çêdibe, bi ahenga

bêje û gotinan, bi derxistina tipên dengdar û avakirina peyvên hevdudanî, bi rêzman û kîtekirinê ava dibe. Ev nîşanên îfadekirina zimên di kursan de giraniyeke xwe a baş heye.

Alîyê din ê ku divê were zanîn ew e ku ev fêrbûna zimên dê bi kêrî çi were û daxwaz çi ye. Ev fêrkirin ji xwendevanan re dikare îmkanê bikaranîna erbabiya xwe bide û bi vê riyê bikaribin piralî zanîna xwe xurt bikin, hem zanîna wan a şexsî û hem jî a bi hevalên xwe re bikaribin bi riya axaftinê û niviskîya bi swêdî bimeşînin. Bi vê zanîna xwe dikarin planê pêşxistin a zimanê xwe bikin û pêşeroja zimanê xwe pêk bînin. Xalên ku meriv di fërkirina ziman û xwendinê de jê dikare destkewti be, zimanên xwendevanan ên zikmakî, zimanên din ên ku dizanin, erbabiya karê wan ên berê û xwendina wan ku berê dîtine, bala wan û pêwîstiya wan e. Erbabî ew e ku kesên bi mustewayek wekhev û newekhev di derbareya zimên de li hev bigûncîne. Ev, cawaziya mustewa wan a xwendina kulturî û erbabiya karîna wan bi hawakî zanistî balanse dike. Ev cawaziya kesan a wekhev û newekhev li ser zanîna zimanê swêdî jî şopê dihêle. Zimanê swêdî, ew kultura ku xwendevan li Swêdê dibîne dikeve çarçoveya fêrkirina zimên û dibe hoya têgihiştina cudaûna kulturî. Ev jî cawazîke interkulturî tîne holê.

Di zikê fêrkirinê de dayîna agahdarî û rênîşandan jî heye. Li ser vê agahdarî û rênîşandanê xwendevan dikare ji bo xwe riyek xwendinê yan jî karkirinë peyde bike û plan bike.

Nirxandin

Weke berê, di nav sfi de du babetên puanan tên bikaranîn. Ew bi navê Baş (G) û Pirbaş (VG) ve têne binavkirin. Dezgeha dibistanên giştî li ser van disekine ku cawaziya wan têxe jiyanê. Ev nirxandin ji rewşa xwendevanan a têgihiştinê, xwendinê, nivîsandinê, axaftinë xuya dibe. Wekî din jî stratejiya xwendevanan û kalîteya rewşa wan erbabiya interkulturî ya wan jî di van puanan de diyar dibe. Di derheqa nirxandinê de hûn dikarin dokumenta wê di *Bedömningsmaterial - Svenska för Invandrare. Kurs A–D.* de bixwînin.

Ji bo alîkariya nirxandinê bikin, navçeyeke bi navê navçeya fahsa sabit heye ku mamoste dikarin ji wê destkewtî bibin da ku pirsên wan li hemû alîyê welêt wekhev û hevgirtî bin. Mebesta fahsa nationelî ne ew e ku bibe fahsa dîplomedayînê lê belê ev dibe alîkî ji qerarên mamosteyan. Di derbareyê fahsa nationelî de raporeke bi evî navê jêrîn heye ku di meha çileya pêşî a sala 2006 an de derket: *(Det nationella provets funktion och status inom sfi.)* Ev rapor li ser bingeha lêkolineke nirxandinê çêbûye. Ev lêkolin di sala 2005 an de li ser fahsa nationelî li ser sfi û materyala nirxandina sfi çêbûye û bi kesên cûr be cûr ve hevpeyivîn çêbûye: Bi rektor, mamoste û bi xwndevanan re li ser deh noqteyan hevpeyvîn çêbûye û hatiye amadekirin. Meriv dikare van raporan di malpera Dezgeha dibistanên giştî de (Skolverket) peyde bike û bîne xwarê. Ev di malperê de: www.skolverket.se di bin rêza sernavê Publikationer de peyde bike.

Dema hewce be ev nêrîn û şiroveyên ji bo plan û kursên sfi dikarin bên guhertin û temamkirin.